Kurdistan

Rojnameyek ji aliyê ragihandina navendî ya PDK-Sê ve tê weşandin

PDK-S
1957

Rojnamakurdistan.com | Kurdistan-Hejmar (267) | NÎSAN / 15-04-2024

# Revandina endam û alîgirên ENKS berdewam e

## «Pêwîste Hevpeymaniya Navdewletî bi berpirsyaretiya xwe rabe»




Kurdistan

Di vê dema dawî de, çekdarên ser bi Partiya Yekîtiya Demokratîk PYDê her yek ji rojnamevan Rakan El-Ehmed bajarokê Girkêlegê, rojnamevan Ehmed Sofî li gundekî Dêrikê, medyakar û endamê Xwecihiya Girkêlegê yê ENKSê Merwan Liyanî, û welatiyê bi navê Hesam Dorsin ji bajarê Dêrikê revandine.

> «Divê Hevpeymaniya Navdewletî rê li van kiryaran bigre»

Derbarê revandina van kesan ENKS di çend daxuyaniyan de ragihand, ev kiryarên PYDê yên li dijî endam û alîgirên ENKSê berdewam in, ku dixwaze bi tirsandina xelkê, têkçûnên xwe yên siyasî û îdarî vedişêrin. ENKS bi tundî van binpêkirinên ku li dijî mafên herî bingehîn ên mirovî ne, şermezar dike û bang li sazî û rêxistinên mafên mirovan û Hevpeymaniya Navdewletî kir ku destêwerdanê bikin û rê li ber van kiryarên PYDê bigirin. ENKS ragiahnd jî, PYD bi van kiryaran yekrêziya helwesta kurdî, azadiyên ragihandinê û siyasî li deverên di bin destê wê de dike armanc, ku hewl dide her dengekî ku rexne li kiryarên wê li dijî xelkê û têkçûna wê digire, bêdeng bike.

Ev yek binpêkirina mafên mirovan û pîvanên exlaqî ye. Ji aliyê xwe ve, Malbata Dorsin revandina 2 endamên wê li Dêrikê şermezar kir û bang li Hevpeymaniya Navdewletî û rêxistinên navdewletî dike, ku fişarê li rêveberiya PYDê û HSDê bikin, da ku her du endamên wê malbetê, Hesam Dorsin û Behzad Dorsin azad bikin. Di daxuyaniya malbatê de wiha hatiye.

> «Revandin binpêkirina mafên mirovan û li dijî pîvanên exlaqî ye »

Weke berdewamiyekê di siyaseta bêdengkirin, qirkirin û girtinê de, çekdarên PYDê endamê Komîta Herêmî ya Partiya Gel a Kurdistanî-Sûriya û endamê Encûmena Niştimanî ya Kurdî Hesam Dorsin, demjimêr 11ê êvarê roja Duşemê 1ê Nîsanê, li navenda bajarê Dêrikê bi otombîla wî revandin. Tevî dûvçûna me bo navendên û dezgehên PYDê, wan hebûna wî li ba xwe red kir, ku ev yek bû sedema peydakirina metirsiyeke cidî li ba me li ser jiyana wî, nexasim Hesam Dorsin nexweş e û birîneke kevin di serê wî de heye. Di demekê de ku em vê revandinê şermezar dikin, em bang li Hevpeymaniya Navdewletî û rêxistinên navdewletî yên li Sûriyê dikin, ku fişarê li rêveberiya PYDê û Hêzên Sûriya Demokratîk bikin da ku endamê Polîtbîroya Partiya Demokrata Kurdistan-Sûriya Behzad Dorsin, ku ji sala 2012an ve revandî ye, û Hesam Dorsin, endamê Komîta Herêmî ya Partiya Gel a Kurdistanî -Sûriya, serbest werin berdan û ji bo misogerkirina ewlehiya wan, ji ber ku ji dema hatine revandin çarenivîsa wan ne diyar e, û em bang dikin ku sînorek ji van kiryaran re were dayîn.

> «Daxwaza serbestberdana Behzad û Hesam Dorsin dikin»

Em tekez dikin ku ev bûyerên revandinê yên berdewam binpêkirineke eşkere ye ji mafên herî bingehîn ên mirovî re di jiyana birûmet de li ser xaka xwe bijîn û ev kiryar tu Kurdekî birûmet ji têkoşîna doza gelê xwe dûr naxe.

### Zêdetir bixwîne...

Tirsa dubare derketina DAIŞ û bihêzbûna vê rêxistinê *Rûpel—3*

Adyabîn û girîngiya diramaya Kurdî *Rûpel—4*

# Li Kurdistana Sûriyê Cejna Remezanê hat pîrozkirin







Hêvî Delî-Qamişlo

Di roja 10 ê Nîsana 2024an, roja yekemîn a cejna Remezanê li piraniya dewletên Musilmanan hat pîroz kirin, û bi taybet li Kurdistana Sûriyê bi awayekî geşbînî û xweşî hat pêşwazîkirin. Û di vê derbarê de rewşa Cejna Remezanê ya 2024an li Rojavayê Kurdistanê çawa derbas bû û hêviyên milet têde çi bûn : Bi boneya hatina Cejna Remezanê xelkên tevaya bajar û bajarokên Kurdî li kurdistana Sûriyê bi kêfxweşî amadekariyên pêşwaziya cejnê kirin û bi dilekî geş tevî hemû astengî û zehmetiyên jiyanê têde derbas dibin pîrozkirin. Û yek ji kevneşopên di Cejnê de têne kirin ku di roja cejnê de serê sibê hemwelatî berê xwe didin mizgeftan ji bo nimêja cejnê bikin, û piştre her malbatek serdana goristanê dikin û fatîhê li ser gora miriyên xwe dixwînin, ku di heman demê de zarok jî amadekariyên xwe dikin û bi Cilûbergên nû berê xwe didin parkên leystokan ango li hin deveran weku kolanên gelêrî mal bi mal digerin û bang dikin( Sibe we bixêr cejna we pîroz be), ji bo ku cejn geştir û xweştir dibe bi ken û dilxweşkariya zarokan. Hevdemê bi helkefta Cejna Remezanê hemwelatiyek ji şêniyên bajarê Qamişlo yê Kurdistana Sûriyê ji Rojnameya Kurdistan re kêfxweşiya xwe wiha diyarkir û got: Bi boneya hatina Cejna pîroz gerimtirîn pîrozbahî arasteyî hemû Musilmanên cîhanê dikin, bi taybet gelê Kurd li herçar parçeyên Kurdistanê û dayîkên Şehîdan û pêşmergeyên qehreman ku ji bo parastina milet û sînorê xaka Kurdistanê di sengeran de cejna xwe pîrozdikin, herwiha berdewam kir ew hêviya cejneke bexteweriyê û aştî ji bo tevaya milet derbasbikin dûrî êş û azaran dixwazin..

> «Tevî rewşa abûriya xerab welatiyan cejn pîroz kir»

Hemwelatiyekî din jî ji Rojnameya Kurdistan re behsa keşûhewaya roja cejnê kir: ku di vê rojê de ji tevahiya Musilmanên cîhanê û gelê Sûriyê bi hemû pêkhatiyên wê re pîrozbahiyan pêşkêşdikin, herwiha ji aliyekî ve kêfxweşiya xwe jî diyar dikin, lê ji rexekî dî ve xemgîniya xwe jî di vê rojê de anîn ziman, ku ji destpêka kirîza sûriyê, her kes dizane ku ji ber ceng û aloziyên rewşa xereb û qeyrana aborî û ne aramiya rewşa ewlehî û jiyanê li seranserî Sûriyê bi taybetî li Rojavayê Kurdistanê bo sedema ku piraniya xelkê koçber, derbider bibin, û li gelek deverên cîhanê belav bûne , û ya herî kêm ji her malekê bêhtirî kesekî li derveyî welêt e, û amaja bi wê yekê kir êdî ew tenê dikarin bi rêya Înternêtê peywendî li gel hev bikin û cejna hev pîroz bikin, û daxwaz dikin ku cejnên werê di rewşeke baştir de û Wekhevî Xêr û Xweşî peyda bibe, û bingavên serkeftî werin avêtin û çareserî ji van pirsgirêk û arîşayên arasteyî milet têne kirin were dîtin, ji bo koçberan de ku karibin li welatê xwe di nêzîktirîn dem de vegerin û cejnên xwe di nav malbat, heval û dostên xwe derbas bikin. Û di vê çarçoveyê de zarokekî Heft salî wiha anî ziman: ku di destpêkê de cejna malbat û hevalên xwe pîroz dikim û hêvîdarim herdem hemû rojên me bi kêf û dilşadî be. Her di dawiyê de Omîdên xelkê ew bo ku cejnên werê bihezkirin, hevbiratî, aştî, azadî, lebûrîn, xweşî, li herêmên Kurdî li Kurdistana Sûriyê belav bibe û Sûriyeyeke Demoqrat were avakirin, êdî milet di nav aramiyê û bi moralekî bilind de li ser xaka xwe vegerin û bijîn.



Henan Cefer

# Dara li pêş (Kurteçîrok)

Stenbol

Cano pir bi Kalo bihîştî lê ti caran pê re rûnenûştî û suhbet nekirî rojekê derfet dît çû ba Kalo… “ti ramanên biyanî tên bale te” Cano got Wek çi?
Li çavê Kalo nêhirî û ket hişê wî dîsa got ramanê biyanî li bal te çiye?
Rûkenî bû û hinekî xwe rast kir û got ji biçûkbûna min de ji bilî ramanên biyanî nabînim
Dê ka em wê ramanên biyanî bibînin
Kalo li xwe vegerî bi bîranînên xwe ket derbasgeha tirsa ji salan de ku bersivên sûdar derînê. Cano hestyar bû awirên wî wî nêçîr dikin û dem wî didizê, Kalo tûrikê bîranînan vekir û raman li hevxistin, tevdan yek jê vebijart balineyek derbas bû got ne ev e Kalo destê xwe avêt ramaneke din û derxist kundê li ser goşeyê xanî got ne ev e Kalo hayî bû ji pirbûna ramanan dest hat girêdan û westiyayî ji xwe pirsî çima ez li ramanên biyanî digerim jiyana me giş biyaniye, bi hedan li Cano nêrî û got ti ramanê biyanî bi min re derbas nebûn e.
-Cano cixare vêxist û dû berda
-Kalo dûyê cixarê şopand
-Cano pirtûk ji çentê xwe derxist û rûpelên wê qulibandin û çend bêje xwandin stemkar, dagîrker, qeyran, şoreş, azadî pê re derbas bûn bi wê bêje yan wek dest hat ser Kalo lerizî bi êşekê hestyar bû bi encama êşkenca xwe hest bû êşkenca di girtîgehê de hatin bîrê û êşa tevî mezin dema gotî “ti ramanê biyanî li bal min tune ne” derew li xwe û cano kir, bi dilşewat li cano temaşe kir
Cano nêrîna wî bi girnijîn pêşwaz kir û got kalo tu ji pirsa min revî ma tu ji min ditirsê? Kalo suhbet guhêrî û got belê raste ev nexweşiyên bi min ketin e ji êşkencê ne wek te dîtî min xwe radestî nexweşiyê kirî lewra
Hewl dikim ketwar û serpêhatiyên xwe ji bîr bikim.
Cano lê mêze kir kalo xemgîn e,hest birîn e, ne li hev e, nikarê karekî bikê, perîşan e li kolanan digerê û carna diçê li civata şahî û şînîyê rûdinê, bi êşa canê xwe dibonijê û carna ji kerbê dibasê dîsa cano got tu dixwazê tiştekî bi min re bibêjê ku tu xwe rihet bikî
-Erê selahdînê me yê eleyobî Filestîn rêzgar kir û radestî ereban kir û ji aliyê xwe ve ereban em dagirker kirin e, îrojî dibêjin rêya rêzgarkirina Filestînê di Efrînê re derbas bê lê kalo hema êkê bipirsiya karê te çiye xwest bila cano têkevê ramanan û bipirsê.
Cano bi destê kalo girt bi hev re çûn çayxaneyê rûniştin qehwe xwest, bi hêdîbûn û bêdeng li fincanê nêrî kalo dît biçûk e lê bi xwe gewre ye ji cano hez kir û pir tiştên kevin yên hatine bîrê gotin, vejîn bû, êşeka gewdê wî sekinî û ji nişka ve jiyan lê vegerî li der ve nêrî dar li pêş çayxane yê bi tîrêja royê xemilî û bedew e bi giyanê ciwanî û neyabdar, cara yekê bû kalo hest bû cansivik e xwest carek din tûrkê ramanan veke ku bersiva pirsa cano bidê di dilê xwe de dît perê çivîka dilêr şîn tên û gotina biyanî got – berî em bi ser Filestînê de bigirîn û xwepêşandinê daxwazan pêk bînin dive em bi ser welatê xwe de bigirîn û banga xwe bi bang û daxwaza şêx se’îd û pêşew Qadî Mihemed re bilind bikin ev ramana gunçav e, layiqî me ye…
Qasekê mit bû bi keserek kûr re got jidil hêvîdarim em qasî bar û berpirsyariyê bin, ramanan şirove bikin nekin tawanbarî, hev bipejirînin berî xelkê.

# Tirsa dubare derketina DAIŞ û bihêzbûna vê rêxistinê

Kurdistan

Çend ajansên hewalgiriyê hişyarî dan ku çalakiyên DAIŞê li Sûriyê zêde bûne, ji sala 2017an ve jî, meha Adara borî ya herî tund bû li Beyabana Sûriyê. Metirsiya DAIŞê li Sûriyê her ku diçe zêde dibe, li gor çend raportan, bi rêya şaneyên xwe yên razayî, DAIŞ plana operasyonan li piraniya deverên Sûriyeyê daniye. Daneyên Fermandeya Navendî ya Amerîkî hejmara çekdarên DAIŞê li Iraq û Sûriyê bi nêzîkî 2500 çekdar texmîn dikin, ku ev jî du qatan ji texmînên dawiya sala borî zêdetir e.
Navenda Projeya Rûbirûbûna Tundrewiyê destpêka vê hefteyê di raporteke de got, DAIŞê ji destpêka îsal

> «Li çolistana Sûriyê DAIŞ hêj çalak e»

ve herî kêm 69 êrîş li naverasta Sûriyeyê pêk anîne û di encamê de 84 leşkerên artêşa Sûriyê û 44 sivîl hatine kuştin. Herwiha amaje bi wê kir, piraniya êrîşan li herêmên beyabanê ku dikevin navenda Sûriyeyê, hatin kirin. Li gorî Navenda Projeya Rûbirûbûna Tundrewiyê, di meha Adara îsal de, DAIŞê herî zêde li navenda Sûriyê çalakî pêk anîne. Herwiha Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) aşkere kir, DAIŞê di meha Adarê de 27 êrîş, di meha Sibatê de jî 26 û di meha Çile de jî 16 êrîş pêk anîne. Di vê navberê de, Alîkarê Enstîtuya Berevaniya Demokrasiyê ya bingeha li Washingtonê ye Bill Roggio gotibû, piştî jidestdana deverên xwe yên sereke, DAIŞ hewl dide hebûna xwe bi rêya şanên razayî biparêze.Tekez kir jî, DAIŞ têk neçûye, bi taybetî piştî lawazbûna hevahengiya Rûsiya û Amerîka li Sûriyeyê derbarê gefên DAIŞê de, metirsiya wê rêxistinê zêde bûye.

> «Pêwîstiya deverê bi Hevpeymaniya Navdewletî heye»

Hevdem ligel zêdebûna êrîşên DAIŞê, Fermandariya Navendî ya Amerîkayê (CENTCOM) duhî da zanîn, wan bi hevkariya hêzên ewlekariya Iraqê û Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD), di 3 mehan de 94 operasyon li dijî çekdarên DAIŞê li Iraq û Sûriyeyê kirine.



# Adyabîn û girîngiya diramaya Kurdî



Idrîs Hiso

Gewîlan

Her salê di meha remezanê de telvizyonên Erebî bi dehan zincîreyên dirama diweşînin, kompaniyên berhemînana dirama bi dirêjeya salê dikevin livûtevgerê û xebatê û di meha Remezanê de her kompaniyek li gel çend kenalên telvizyonê rêkdikeve jibo weşandina van zincîrediramayên Erebî ku bi hemû zaravayên Erebî û hemî mijaran, ji mijarên dîrokî, komîdî, civakî…hd li xwe digrin. Dirama li nav welatên cîhanê pîşeyekî hunerî, çandî û yek ji bereyên şer e jî, kîjan zimanê ku îro dirama, sînema, stran, fîlmekerton ..hd zor pêtêçêkirin, ew ziman zindîtir, berfirehtir û belavtir dibe.
Bi nerîna min, niha hezkir û nehezên Kurdan, bi rêka dirama dikevin nav malên me, şerekî nerim pêwîstî bi çek, rijandina xwînê, derbaskirina sînoran û dagîrkirina gund û bajaran navê li beramberî me dikin. Bi ser ku seranserî xaka Kurdistanê ji aliyê dijmin ve hatiye dagîrkirin, lê berê wan nikarîbûn rasterast derbasî malên me bibin, lê niha û bi rêka stran, fîlmên xweş û aktrên ciwan bi rehetî dikevin malên me û derî, ban û pencere û dilê jin û zarokên me jî ji wan re vekirî ne.
Kurd di vê meydana şer de jî di ber xwe dide û dixwaze cihê piyê xwe di vê bazarê de hebe, li gorî imkan û derfetên xwe hunermend, derhêner, akter û goranîbêjin Kurd berdewam li ber xwe didin û bi saya wan niha zarokên me li stran û diramayên Kurdî temaşe dikin, bi vê yekê jî bi çand û zimanê xwe ve bêhtir têne girêdan.
Tevî ku pişka Kurdan di vê bazarê de ne li gorî xwestek û hêviyan ne jî, lê em dikarin bêjin di van çend salên dawiyê de mirov dikare bibîne berhemên Kurdî zêde dibin û bînerê Kurd nema êsîrê temaşekirina dirameyên Tirkî, Hindî, Erebî û Amrîkî û welatên din in.
Di vê gotrê de ez dê behsa dawî zincîrediramaya Kurdî Adyabîn bikim.
Adyabîn li ser ekranê Kurdistantv û Zagros Erebiye têweşandin, diramayeke dîrokî ye, yek ji mijarên herî hestiyar di dîroka Kurdistanê de behsdike, ew jî sed salên borî ji dîroka Kurdistanê(Herêma Kurdistanê), û destpêka guhertinên mezin li Rojhilata Navîn bi rûxandina Osmaniyan û hatina Fransa û Birîtaniya bo welatên rojhilat û durustkirina welarên nû, ku Kurdistan di wan guhertinan ma di bin destan de û miletê Kurdistanê rastî hemû hewldanên tinekirin û qirkirinê hat.

**Hewlêr, Adyabîn, Erbîl, Erpaêlo, Hidyab**

Ev hemû nav li Hewlêra paytexta Herêma Kurdistanê tênekirin, Hewlêra ku landika şaristaniyên cihêwaz bûye, Somerî, Aşûrî, Mîdî, Sasanî, Yonanî, Erebên Umewî, Ebsî, Osmanî, piştre jî Inglîz û dewlta Erebî ya Iraqê, hemû bi sedên salan, an jî bi dehên salan mane, her yekî navê xwe li Hewlêrê kiriye, lê Hewlêr qet jinav neçûye, û ji bin toza dagîrkeran herdemê serê xwe rakiriye û berê xwe daye rokê û bi çand, nasname û zimanê xwe maye Kurdî û Kurdistanî.






**Zincîredirama Adyabîn**

Heta nivisandina vê gotarê bi tenê min 10 xelek ji vê dirameyê dîtiye, zincîrediramaya Adyabîn ji berhemên dezgeha Kurdistantv ye, hejmareke mezin ji aktrên Kurd û Kurdistanî navdar têde beşdarin, herwisa çend aktrekî biyanî jî têde beşdar in, herwisa zêdtir ji 2 hezar kes wek kombaris têde kar kiriye, ev yek dide diyarkirin ku bi pereyekê mezin û kedeke mezintir hateye berhemînan.
Bîrokeya vê zincîrediramayê ji aliyê birêvebirê Dezgeha Setelayta Kurdistan, sînaryo Kerîm Ebdulla, Derhênana Hesen Elî Xan, lê mixabin Kerîm Ebdulla berî weşandina vê dirameyê koça dawî kir.
zincîredirameyeke mêjûyî ye behsa sed salên borî ji mêjûya Herêma Kurdistanê dike, Hewlêr jî di vê zincîrê de navenda bûyeran e.
Di 10 xelekên borî de mirov dikare behsa çend xalan bike
1- Cihê wênekêşanê keleha Hewlêr a dêrîn e, ku niha û berê jî senter û navenda bajêr ya siyasî, civakî, çand û abûrî bû, ev cih guncaw e û bi şêweyekî din çav û ronahiyê tîne ser Kelehê.
2- Cil bi dîzayneke ciwan û bizanebûn hatine durust kirin ku bi cilkên wê serdemê ve diçin, girîngî û çêja Kurdan di hilbijartina cilan de nîşan didin.
3- Zimanê vê diramayê devokê Hewlêrî ye ji bilî ku hunermendên din bi hin devokên deverên din yên Kurdistanê qise dikin û ev yek pêngaveke baş e ku xelkê Kurdistanê dovkên cuda di drama de bibînin... ev yek roleke erênî di civakê de dilîze, û dihêle ku xelik devokên xwe di diramayê de bibînin, ev faktrekî başe jibo parastina van zaravayan, û belavbûna wan dinav xelkên Kurdistanê, da ku bêhitr karibin zaravayên din bibhîzin û bêhtir ji hevudin fambikin.
4-Di Adyabîn de, firerengiya civata Kurdistanê têdiyarkirin, em di nav kelehê de mirovên, Cû, Musliman, Mesîhî, Kurd, Ereb, û Turkimanan dibînin, em dikarin bêjin dirama Kurdî di vê yekê de pêşeng e, berawird bi diramaya Tirkî, Erebî û Farsî jî, çimkî mirov dikare bêje diramayên navborî qet nêzîkî vê mijarê nabin.
5- Driamaya Kurdî ji wan jî Adayabîn, li gorî nirx û nerîtiyên civata Kurdistanê hatiye hûnandin, û dûrî ibtizalê, lewma dikare bibe diramyeke ku bi tevyî malbat kare bi hev re lê temaşe bike, çiku diramaya Erebî, Tirkî û Hindî jî bi şêweyekî dûrî aqil dîmenên, bikaranîna madeyên hişbir, vexwarina elkûl û dîmenên tundîtujiyê ne dijî afretan û dijî mirovan, ev yek dihêle ku çande xirab li civatê were belav kirin.
Di vê kurte gotarê de min xwest ez amajeyê bi girîngiya diramaya Kurdî, di parastina ziman, çand û civata Kurdî de bikim.
Bihezkirina diramaya Kurdî û karkiridin bi şêweyekî zanistî li ser belavkirina wê di nav civata Kurdî de, roleke mezin dilîze di rizgarkirina bînerê Kurd ji temaşekirina diramayên biyanî, ji bilî rola wê ya girînig û pêwîst di vejandina Zimanê Kurdî de û nêzîkirina zaravayên kurdî jihev, ku di encamê de bihêzkirina civata Kurdî bi xwe ye.